# Jîn

“Jîn” bi Kurdî u Inglîzî

www.jeenuazadi.com

Jimara 13 | Heyva Êyarê 2007 | Vercinye, Emrîke | perê - 1

Miruv ji gîanewera feriq e; feriqê hey bi axiftinê. Miruv peyva bi kar dîînin da biaxivin li gel êk u dû.

Ji demê Ademî u Ḧewaê ḧeta demê pêẍember Nuḧî miruva bes *êk* ziman diaxift. Belê nuke pitir ji 6000 ziman li dinyayê hey.


Paşî reşe avê (feyezan) hebî - ewê mezin ku ḧemî ‘edir ji bilî mala Nuḧî u xêzana wî u hindek ji gîanewera xirab kir.

Piştî hingê her sê kurrêt Nuḧî u jinêt wan biçîk u nevî hebîn - ḧeta carek dî tijî miruv hebîn – tijî millet li dinyayê. Belê Neynewa (bajêrrê Mîsil) ji destê Nemrudî (kurrê Kuşî, kurrê Ḧamî, kurrê Nuḧî) ava kirî.

Li wê demê Xwidê *tijî* ziman çêkirin çunku miruv xelkê ta’eta Xwidê ne dikir. Piştî reşe avê, Xwidê gut Nuḧî u kurrêt wî, “Berî bidin u zêde bin u erdî tijî bikin.” Kurrêt Nuḧî pîa wî kir (berî dan u zêde bîn), belê pîa wî ne kir çunku erdî tijî ne kir. Belê, ḧemî miruv maîn li êk cihê u Xwidê ne razî bî.

Ev mêjue çêkirna zimana ji destê Xwidê ye. Eve ji pirtuka pişka 10ê li “Destpêkirin”ê u ji destê pêẍember Musaî nivîsî:

## Kelha “Babil”



Xelkê erdî hemîya bi êk zimanî diaxiftin. Demê barkirîn bu rexê rojhelatê deştek li erdê Şîn’arî dîtin u li wêrê akincî bîn. Îna hindeka gute hindeka, “Werin da em baştirîn li binêt baş qelandî çêkîn.” Bera bi li binêt qelandî biguhurrîn u qor bi zeftê u paşî gutin, “Werin da em bu xu bajêrrekî u kelhekê ava bikîn serê wê bigehîtin esmana, u dê navekê bu heta hetayê bu xu deynî, da em li ser hemî rîê erdî pelate u mişext ne bîn.”

U Xwidê hate xwarê daku ewî bajêrr u kelha miruva dest bi ava kirna wî kirî bibînit. U Xwidê gut, “Heker êk millet bin u bi êk zimanî biaxivin, hêş ji destpêkê ev tişte kirin. Vêca çi tiştê wan bivêt bikin li def wan zeḧmet nabit. Werin da em biçîn xwarê u ezmanê wan pelatekîn daku kes di ezmanê kesê negehit.”

U husa Xudanî li ser rîê erdî hemîê pelate u mişext kirin u dest ji avakirna bajêrrî ber da. Ji ber hindê navê wî bajêrrî kirin “Babil” çunku Xwidê ezmanê hemî xelkî erdî têkşeland u paşî her ji wêrê li ser rîê erdî hemîê pelate u mişext kirin.

Paşî Xwidê gut Musaî (u Musaî gut xelkê), “Bi neḧeqî bi navê Xudanî – Xudayê xu – ne axive, çunku Xudan wî kesî siza didit yê bi neḧeqî bi navê wî biaxivit.”

Wextê pêẍember ‘Îsa li ser erdî bî, wî gut xelkê, “Qet sînd ne xwin: ne bi esmanî, çunku ew textê Xwidê ye, u ne bi erdî, çunku ew cihê pêt wî ye, u ne bi Urşelîmê, çunku ew bajêrrê paşayê mezin e, u ne bi serê xu jî, çunku tu ne şêî mîekê bi tinê jê spî yan reş bikî. Bila axiftina we, “belê” “belê” bit u “nexêr” “nexêr” bit, u ji vê pêvetir ji xirabîê ye.”

Gelek miruv li dinyayê me bi neḧeqî bi navê Xwidê bi kar dîînin. Her dem wesa dibêjin: “Ya Xwidê!” u “Bi Xwidê!” – u rast e yarmetîê Xwidê ya cidî naxwazin. Çunku tijî husa diaxivin, em bawer dikîn “çi nîne, ez jî dê husa bêjim.” Belê çi *heye*. Gelek qedirê Xwidê nagirin u pîa wî nakin.

Bila em kirîna ta’eta Xwidê bikîn u zimanê me bi qedirê wî bêjîn.


© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Azadîa rastî çi ye?

Sîndkirin gring e li welatêt me u li ‘edetêt me. Eve he hindek beȟsa sîndkirina Emrîke dikit:

Seruk, dadwer, berevan, u serbaz pêtivî ye sînd bixwin bu welatê xu u bu desturê. Piştî hilbijartina xu, serukê Emrîke li kumbînî sîndê dixwit. Pêtivî ye ew destê çepê li ser Incîlê deynit u destê rastê rakit u sîndê bixwit dê bi wucdan desturî kar bînit. Sînda wî eve he ye:

> Ez eve cidî sîndê dixwim ku ez dê bi rastî karê serukê bigirim u dê desturê Emrîke parêz kim u parêzim.
> - Sînda serukê, li desturê Emrîke

Li dadgehê, pêtivî ye polîs u şahid sîndê bixwin da rastî bêjin u tiştek dî nabêjin.

Heker muşextî divêt cinsîê Emrîke werbigirit, pêtivî ye biçit kumbînekê u destê rastê rakit u dilsozîa Emrîke sînda bixwit. Ewan jî pêtivî ye bêjit dilsozîa welatê kevin nîne.

Heker miruvek dibit dixtur li Emrîke, pêtivî ye sînda namîs ya exlaq, sincî u pîşekar bikin bi Sînda Hipokratik [Hippocratic Oath] yan Sînda Lezanye [Lasagna Oath].

Bîk u zava li mehrê ji berî Xwidê u xêzan u hevala sîndê dixwin dê ȟe ji êk u dû bikin – heker jîan baş e yan ne baş e - ȟeta êk ji wan mirit.

Deyk u bab yêt bawerîa ‘Îsayê dikin biçîkêt xu bînin li dêrê u sînd ji berî Xwidê u xelkê dêrê dixwin da biçîk xudan dikin bi rêka namîsa Xwidê.

Eve ȟemî numunêt sîndê ne yêt cidî li ‘edetê Emrîke. Pêtivî ye em bînîn bîra xu Xwidê paşayê me ye u ew destur u serukê me ye – u em pêtivî ye jîanêt xu bijîn bi rêka namîsa Xwidê ye.

Wextê me rast yê hey u rastê bizanîn u tê bigehîn, dê bu me azadîa rastî hebit. Azadîa rastî ne bi sîasetê ye. Belê azadîa rastî bi dilê me ye. Tijî miruv yêt heyn li welatekê “azad” dijîn, belê wan azad nîne çunku bi jîanêt wan azadî nîne. U tijî miruv yêt heyn li welatêt Şu’î ku azadî bi sîasetê nîne, belê ew miruv azadî yêt heyn çunku rastî yê hey. Bila Rast bizane.

**Azadî – heker reh hebit –**
**dê gul zî şîn bit.**

– Corc Waşîngten


© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Eyub

## Jîana Eyubî

Zelamek li erdê ‘Us dijîya, navê wî Eyub bî. Ew zelamekê baş u bê kêmatî bî. U ji Xwidê ditirsa. U xu ji xirabîê dida rexekê. U Eyubî ḧeft kurr u sê kiç radan. U hijmara kelupelê wî gehişte ḧeft hizar sera ji miha u sê hizar ji ḧêştira, u pênc sed cutêt çêla u pênc sed kera. Belê xizmet karêt wî gelek bîn. U ev zelame ji hemî zelamêt rojhelatê meztir bî. U kurrêt wî fêr bîn ku xwarnêt ber fireh li malêt xudan in u daxwaza her sê xoşkêt xu dikirin daku bişkdarîê têda bikin. U demê rojêt daxwazkirna xwarnê bi dumahî dihatin, Eyubî gazî dikire kurrêt xu, u ew pîruz dikirin u hêşta spêdê zî radibî. U li dîv hijmara wan ewî gurîêt sutinê pêşkêş dikirin u digut, “Ne weku kurrêt min gunneh diderheqa Xwidê da kirîn u gutinêt ne baş gutbine Xwidê u Eyub li ser vê çendê berdewam bî.

## Xwidê destîrê didite Iblîsî Eyubî ditaqî bikit

U rojekê Iblisî li def Xudanî amade bî. Îna Xudanî pisîara Iblisî kir, “Tu ji kîve diêî?” Îna Iblîsî bersiv da, “Ji gerrîana erdî u ez dinav da gerram.” Îna Xudanî gute Iblîsî, “Erê tu berê xu da kuîlê min Eyubî? Kes weku wî li erdê nîne – ew zelamekî bê kêmatî ye – u ji Xwidê ditirrsit u xu ji xirabîê dite rexekê.” Îna Iblîsî bersiv da, “Erê, ma bi her we Eyub ji Xwidê ditirrsit? Mane te li durêt wî u li durêt mala wî u heçîê hey tekutan kirîe? Te hemî karêt wî yêt pîruz kirîn. U te erd ji kelupelêt wî tijî kirin. Belê heker tu jê bistînî, dê di rîê te da civîna dite te.” Îna Xudanî gute Iblîsî, “Eve ez dê heçîê hey deme destê te u li jêr desthelatî ya te, belê destê xu drêj ne ke yê daku jîanê bigehînî yê.”

U rojekê kurrêt Eyubî u kiçêt wî li mala birayê xu yê mezin dixwarin u mey vedixwarin. Êk hat def Eyubî u gutê, “Demê çêla kêlan dikir u dewar bi rex wan ve diçerîn, hêriş kerêt Sebeîya bi ser me da girtin. U talan kirin u bi devê şîrî xulam kuştin. U ez bi tinê qurtal bîm daku bêm nuke bigehînim te.” U demê ew diaxift, êkê dî hat u gut, “Baruvek ji esmana hate xwarê u pez u xulam hemî sutin u xwarin. U ez bi tinê qurtal bîm da nuke bigehînim te.” Demê wî diaxift, yê sîê hat u gut, “Sê tîp ji Kildanîya hêriş înane ser me, u ḧêştir talan kirin xulam bi devê şîrî kuştin. U ez bi tinê qurtal bîm da nuke bigehînim te.” U hêşta evî diaxift yê çarê hat u gut, “Kurrêt te u kiçêt te dixwarin u mey vedixwarin li mala birayê xu yê mezin. Bayekê dijwar ji ber yê hat, u her çar kujîêt xanî êxistin u kete ser wan u hemî mirin u ez bi tinê qurtal bîm da bêm nuke bigehînim te.” Îna Eyub rabî u cukîê xu dirrand. U pirça serê xu birrî u xu çav çavkî havête erdî u Xwidê perist u gut, “Ez rîz ji zikê deyka xu derketim, u dê rîz vegerrîm wêra henê, Xudanî da u bir, u bila navê Xudanî pîruz bit.” Li vê hemîê Eyub diderheqa Xwidê da xelet ne bî u çi karêt helhelî ne kirin.

## Taqîkirna Eyubî ya dûê

U careka dî Iblîsî li def Xudanî bi rêzgirtin amade bî. Îna Xudanî gute Iblîsî, “Erê, te berê xu da kuîlê min Eyubî? Ew zelamekî baş e u bê kêmatî ye. U kes weku wî nîne. U ji Xwidê ditirrsit u xu ji xirabîê didite rexekê u heta vê gavê yê li ser wî bê kêmatîê ye. U her çende te ez li wî xirjandim daku bibê eger wêran bikim.” Îna Iblîsî bersiv da, “Pîst bi pîstî! Hindî miruve heçîê hey didit daku gurî xu bikit, belê demê tu dest dikî ye hestî u goştê wî, ew hîngê dê drîê te da civîna dite te.” Îna Xudanî gute Iblîsî, “Eve ez dê dime destê te, belê deruna wî biparêze.”

## Eyub Tuşî Kulka dibit

Îna Iblîs ji def Xudanî çû, u Eyub tuşî kulka kir u hemî leşê wî vegirt – her ji gupîtka serê wî u heta binê pêt wî têkda bîne kulk. Îna Eyub di nîva xulîê da rînişt u dest havête qafkekê u kulkêt xu pê xurandin. Îna jina wî gutê, “Erê heta vê gavê tu li ser bê kêmatî ya xu maî? Civîna bike Xwidê u bimire.” Îna bersiva wê da, “Tu weku miruvêt nezan diaxivî. Ma dê bi xêrê ji def Xwidê qayîl bîn u bi xirabîê qayîl nabîn?” U devê hemîê da, lêvêt Eyubî çi xeletî diderheqa Xwidê da ne gutin.


- Pirtuka Eyubî 1:1-2:1, 2:3-10


© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

## Peyvêt Kurdî Berambera Inglîzî:

# Jîyana Eyubî

# Job




BERAMBERÊ →

3 baş
5 nav
6 şîr
9 bela
10 bê kêmatî
12 goşt
17 talan kirin, talan bike
18 kuîl
20 ḧêştir
23 kulik
26 çêl
27 ḧeft kurr
29 kelupel
30 dijwar

XWARÊ ↓

1 hestî
2 ba
4 sînd xwarin, sînd bixwe
7 xwarnêt ber fireh
8 jin
9 sê kiç
11 Xwidê
13 xanî
14 civîna dan, civîna bide
15 Iblîs
16 ketin, bikeve
19 sutin, bisuje
21 qurtal bîn, qurtal bibe
22 pîruz kirin, pîruz bike
24 kujî
25 ker
27 pîst
28 Eyub
31 xirab




*[Bersiva vê Beramberê li guvara meha bêt dê ête belav kirin.]*



© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

ji meha burî:


# Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîḧ



## Easter







© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Fêrbîn u Fêrkirin ya Zimanê

## Fêrdarîa Guhdarî ya "Temam"ê

Ew "temam"e fêrdarîek ya guhdarîê u ya nivîsandinê. Xwîndikar çi tişt nabêjit wextê fêrdarî dinivîsit. Mamosta nivîsandinê bu xwîndikarî dixwînit; xwîndikar guhê xu didit u dinivîsit. Piştî xwîndikar fêrdarîê xilas bî, mamosta dişêt babetê bi kar bînit da li gel xwîndikarê axiftinekê dest pê bikit yan fêrdarîeka nivîsandinê bidit xwîndikarî.

**Nivîsandinê hilbijêre.**

- Nivîsandinê xu binvîse yan çîrokekê kort hilbijêre da "temam"ekê çêkî. Tu jî dişêî stranêt tumarkirî bi kar bînî, belê stran fêrdarîê guhdarî ya zeḧmet çunku dengê ewê dibêjit drêjkirî ne.
- Nivîsandinekê hilbijêre heker her dû babet u rêzman baş in bu xwîndikarê.
- Dû kapîêt nivîsandinê çêke: êk kapî bu mamosta da bixwînit, u ji kapîa dûê dê fêrdarîa temamê çêkit.

**"Temam"ê çêke.**

- Her peyv ya Ḧeftê Ḧeta dehê jê veke u xatekê vale bihêle. Heker her peyv ya Ḧeftê jêvekirî ye, fêrdarî zeḧmettir e çunku xwîndikar pêtivî ye zîtir binvîsit. Heker her peyv ya dehê jêvekirî ye, fêrdarî sanahîtir e çunku xwîndikar pitir wexit yê hey da bersivê binvîsit.
- Drêjahîa xata vale pêtivî ye wek êk bin da xwîndikar nizanit heker bersiv peyvekê drêj yan peyvekê kort e.
- Dûbare cihî bihêle li navbera her rêzekê.
- Jimarekê binvîse li bin her xatê vale.
- "Temam"ekê bu xwîndikarê xu kapî bike. "Temam" yê destpêk bi xu bigire da bu xwîndikarêt dî kapî bikî.
- Bersivêt xu binvîse. Pêtivî ye jimara her bersivê wek êk e ya xatê vale.

**"Temam"ê nîşa bide.**

- Fêrdarîa "temam"ê bide xwîndikarê xu.
- Bêje wî hişîar guhê xu bide u peyvêt kêm binvîse li ser xata.
- Nivîsandinê bixwîne bi dengekê tebî'î u xwîndikar pêtivî ye bersiva binvîsit.
- Bêje xwîndikarê carek dî guhê xu bide u şulê xu dirist bike.
- Carek dî nivîsandinê bixwîne heker xwîndikarî divêt.
- Bersiva pisîarêt xwîndikarê heker di hindek peyva nagehit.
- Xwîndikarî bihêle da şulê xu dirist bikit derheqê Bersiva.
- Beḧsa babeta nivîsandinê bikin.

**Fêrdarîa "temam"ê ya li perê dî bi kar bîne.** Bêje hevalekê vî perî bixwîne bu te u tu binvîse peyvêt kêm li ser xata vale. Bersiva li binê ye.

© 2007 by Şirîn

**Bersiv**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1. fêrdarîek | 4. dişêt | 9. Nivîsandinekê | 14. ye | 19. bihêle | 24. xwîndikarê | 29. hindek |
| 2. wextê | 5. dest | 10. bu | 15. Heker | 20. xatê | 25. kêm | 30. derheqê |
| 3. xu | 6. Nivîsandinê | 11. da | 16. çunku | 21. destpêk | 26. u | |
| | 7. Tu | 12. "Temam"ê | 17. xata | 22. Bersivêt | 27. guhê | |
| | 8. fêrdarîê | 13. u | 18. heker | 23. e | 28. nivîsandinê | |

"Jîn" guvareke têtе nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom

© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

## Fêrdarîa Guhdarî ya “Temam”ê

Ew “temam”e _______________ (1) ya guhdarîê u ya nivîsandinê. Xwîndikar çi tişt nabêjit _______________ (2) fêrdarî dinivîsit. Mamosta nivîsandinê bu xwîndikarî dixwînit; xwîndikar guhê wextê _______________ (3) didit u dinivîsit. Piştî xwîndikar fêrdarîê xilas bî, mamosta _______________ (4) babetê bi kar bînit da li gel xwîndikarê axiftinekê _______________ (5) pê bikit yan fêrdarîeka nivîsandinê bidit xwîndikarî.

**Nivîsandinê hilbijêre.** _______________ (6) xu binvîse yan çîrokekê kort hilbijêre da “temam”ekê çêkî. _______________ (7) jî dişêî stranêt tumarkirî bi kar bînî, belê stran _______________ (8) guhdarî ya zeḧmet çunku dengê ewê dibêjit drêjkirî ne. _______________ (9) hilbijêre heker her dû babet u rêzman baş in _______________ (10) xwîndikarê. Dû kapîêt nivîsandinê çêke: êk kapî bu mamosta _______________ (11) bixwînit, u ji kapîa dûê dê fêrdarîa temamê çêkit.

_______________ (12) **çêke.** Her peyv ya ḧeftê ḧeta dehê jê veke _______________ (13) xatekê vale bihêle. Heker her peyv ya ḧeftê jêvekirî _______________ (14), fêrdarî zeḧmettir e çunku xwîndikar pêtivî ye zîtir binvîsit. _______________ (15) her peyv ya dehê jêvekirî ye, fêrdarî sanahîtir e _______________ (16) xwîndikar pitir wexit yê hey da bersivê binvîsit. Drêjahîa _______________ (17) vale pêtivî ye wek êk bin da xwîndikar nizanit _______________ (18) bersiv peyvekê drêj yan peyvekê kort e. Dûbare cihî _______________ (19) li navbera her rêzekê. Jimarekê binvîse li bin her _______________ (20) vale.

“Temam”ekê bu xwîndikarê xu kapî bike. “Temam” yê _______________ (21) bi xu bigire da bu xwîndikarêt dî kapî bikî. _______________ (22) xu binvîse. Pêtivî ye jimara her bersivê wek êk _______________ (23) ya xatê vale.

**“Temam”ê nîşa bide.** Fêrdarîa “temam”ê bide _______________ (24) xu. Bêje wî hişîar guhê xu bide u peyvêt _______________ (25) binvîse li ser xata. Nivîsandinê bixwîne bi dengekê tebî’î _______________ (26) xwîndikar pêtivî ye bersiva binvîsit. Bêje xwîndikarê carek dî _______________ (27) xu bide u şulê xu dirist bike. Carek dî _______________ (28) bixwîne heker xwîndikarî divêt. Bersiva pisîarêt xwîndikarê heker di _______________ (29) peyva nagehit. Xwîndikarî bihêle da şulê xu dirist bikit _______________ (30) Bersiva. Beḧsa babeta nivîsandinê bikin.

“Jîn” guvareke têtе nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Elif Bê


| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| a | ا ئا ـا ـا | j | ژ ژ ـژ ـژ | t | ت تـ ـتـ ـت |
| b | ب بـ ـبـ ـب | k | ك كـ ـكـ ـك | u | و ئو ـو ـو |
| c | ج جـ ـجـ ـج | l | ل لـ ـلـ ـل | û | وو ئوو ـوو ـوو |
| ç | چ چـ ـچـ ـچ | l | ڵ ڵـ ـڵـ ـڵ | wu, û | وو |
| d | د د ـد ـد | m | م مـ ـمـ ـم | v | ڤ ڤـ ـڤـ ـڤ |
| e | ە ئە ـە ـە | n | ن نـ ـنـ ـن | w | و و ـو ـو |
| ê | ێ ێـ ـێـ ـێ | o | ۆ ئۆ ـۆ ـۆ | x | خ خـ ـخـ ـخ |
| f | ف فـ ـفـ ـف | p | پ پـ ـپـ ـپ | ẍ | غ غـ ـغـ ـغ |
| g | گ گـ ـگـ ـگ | q | ق قـ ـقـ ـق | y | ی یـ ـیـ ـی |
| h | ھ ھـ ـھـ ـھ | r | ڕ ڕ ـڕ ـڕ | z | ز ز ـز ـز |
| ḧ | ح حـ ـحـ ـح | r | ر ر ـر ـر | ’ | ع عـ ـعـ ـع |
| i | ئـ ـئـ | s | س سـ ـسـ ـس | | |
| î | ی ئیـ ـیـ ـی | ş | ش شـ ـشـ ـش | | |

© by Şirîn 2003


© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Cuan

Ev maȟfîre ji Zaxo e, 2007.




© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.